FERHAD IÇMO

LÊMIŞTA ZOZAN

LÊMIŞTA ZOZAN

HELBEST
1988

LÊMIŞTA ZOZAN

Helbestvan: Ferhad Içmo

Derhêner û kombiyûter: F. Içmo

Çapa dîjîtal
Sîrwan Hecî Berko
Malpera Amûdê
www.amude.de
info@amude.de

Hamû mafên çapê parastî ne.
© Ferhad Içmo û malpera Amûdê (01/2002)

NAVEROK

Rabe Helebça 5
Efsana kevra 8
Hewara dil 11
Gula bin linga 13
Destê min bigre 15
Ketine xewê 16
Gula zozana 18
Roka evînê 19
Rahêj tembûrê 21
Xecxecokê 23
Çemê Feratim 24
Erê Cûdî 26
Gulistana min 27
Dayê 28
Mirna evînê 29
Rabe dilê min 33
Bihara dîn 34
Hozanê sax 36
Dilê xewar 39
Te ez hiştim 42
Hêvya min 43
Çima te barkir 44
Li welatê min 45
Pêlên evînê 46
Rûpelê jînê 47
Nesrîna min 49
Xwezî bimama 51
Def û daholim 57
Perdên şevê 59
Gula bejî 61
Bese 63

RABE HELEBÇA

Li ser hinarka hêsir man rêwî
vebû di dilde birînek cêwî
kes tine jêke destê vî dêwî
wilo Helebça namîne sêwî
*** * ***
rabe Helebça ji derya xwînê
ji nû bihûne çîroka jînê
bide sêwîya tîna evînê
hêsrên jin biya dîroka kînê
*** * ***
doh tu şeherbû bi qîr û gazî
nesrîn ji pela îro man tazî
dilê birîndar çawa wê razî
nalîn û hewar tu çi dixwazî
*** * ***
xuşka tey mezin ew Aleqemşê
hate gurandin bêdeng di hewşê
hate wêrandin bipirs li rewşê
xwîn xistin xamê ji bona neqşê
*** * ***
li kelhe dizê bumbe barandin
destarê mirnê bê hiş gerandin
zarok bi topa hatin mirandin
zikê Bûkên nû sivik çirandin
agrê li Zêwa ma qey vemirî

gor va çirandin zarokên mirî
nema dirêsim şalûl û qumrî
ew jî weke me mane bê perî

* * *

çavê xwe veke ey cîhana kor
biner li xwînê li jêr û li jor
xistin bin linga gula kesk û sor
kevoka aştyê nake more mor

* * *

were bibhîze ey cîhana ker
kê gul weşandin ji ser şaxê ter
kê li Helbça vêxist agrê şer
kevoka aştyê ket bê çeng û per

* * *

cîhan bê denge li me nalenal
bumbe dibarin li deşta Xormal
xistin bin axê xort û qîz û kal
man bê dê û bav kulîlk û mendal

* * *

kurkirin kezyê serê Sêrewan
buhişta xewna bûka kurdistan
perwanên mirnê xwe berdan ezman
xerdel û napalm dibare baran

* * *

hewar û gazî ma kes nabhîze
leşkerê mirnê bi me dilîze
pirbûn li me diz şeva me zîze
bûka nav perda hînakê qîze

* * *

qêrîna xamê mirya ranake
keleha mirnê ew xeranake
xwînmij bi xweşyê ji vir barnake
divê gelê dîl serê xwe rake

* * *

serê xwe rakin roka me hilat
berê xwe bidin zozanê Welat
gelek buhaye qelen û xelat
li hêvya wene ax û av û lat

11 – 4 – 1988

.

EFSANA KEVRA

Serê xwe hildin termên dêr yasîn
li kefer qasim zû bikin mizgîn
bera nenalin Sebraw Şatîla
volqana kevra derbû l' Felestîn

* * *

sitêra Hêrtzil bû hezar parî
kevrên mendala çirandin tarî
kaşiwê destê leşkerê Bîgin
bumba hêstira bi wan nikarî

* * *

bi hêrz û tirsin pêlên lehya dil
keçên nûhatî dixin çava kil
berê xwe didin dîlana welat
di dest wan kevir dirin mil bi mil

* * *

ji xew rabûne pîrên dîl û mest
kevrê tifka sor wanjî xiste dest
pişt xûz û çav kor divên herin şer
bûye efsane xewna wa dixwest

* * *

di dest mendala ew lagên kevir
di çav neyara bûn çek û agir
davên ser çavê leşkerê Pêrêz
li dû rêzdibin qêrîn û awir

* * *

dayik radhêjin ferşikê Pela
li Quds û Yafa Lid û Ramela
berê xwe didin singiwên mirnê
ji bo ku vebin pişkovên gula

* * *

Keverên ber serê gorên Kuştîya
bi lez xwe dixin destê Sêwîya
kevir bûne dost bûne top û teng
bûne dismalkên hêsrên jin bîya

* * *

nema bi tirse şeva reşû zîz
xwîna xwe didin kal û xort û qîz
ji mirnê dertê şefaqa jînê
bera bibhîzin London û Parîs

* * *

bera bibhîzin dîn û hirç û şaş
ewên bo dojmin bûn dost û qeraş
bi lez xwe berdan bin konê Da'ûd
ji bo qertela pirkirin kelaş

* * *

çavê xwe negir Enwerê Sadat
te hiş birbû kur hey malik mîrat
xortên Felestîn tev bûne Xalid
Israîl maye dev ji hev û mat

* * *

çil sal bi gilî kêmnebû sitem
kesî guh neda hêsrên weke çem
Tatşir û Rîgin dest didin Bîgin
helweşandin tev rez û bax û lem

* * *

em te dibînin xuşka Felestîn
em dostê tene bipirs ji Hetîn
lê îro çibkim tu jî vê zane
hevalên tene Pêşmergên cengîn

* * *

çibkim Felestîn îro Kurdistan
ew jî weke te ketye bin destan
bê teng û tope bê al û paytext
nenas û bê kes bê nav û nişan

* * *

lewra nikare tiştekî bêje
ji ber fosforê gedî û gêje
li wê dibare xerdel û lîsyom
Sedam bê fedî Kurda dibrêje

* * *

bibûr Felestîn li me tu negir
gerek bi tere me hilda agir
lê têl û sînor me dihêlin dûr
bijî her bijî şoreşa kevir

* * *

15.4.1988

.

HEWARA...DIL...

Ger bi xweşyê , rojê Jînê, bêne pîvan
bi awaza , bi dîtina , sor nêrgizan

bi helbesta , bi seyrana, bi nû cejna
bi tewafa , dêm û xalên , zirav bejna

jiyana min , tev tarîye, wek şeva reş
maye hisret di sînga min,rojek rûgeş

tim dinalim , di şikefta ,wekî Ferhad
şêrîna min ,di bin desta , dikî firyad

xweşyê barkir ji warê min bê poşmanî
konê êşa , li min vegirt , bi giranî

saz û helbest tevde revyan ji nav têla
lehya xwînê gul û nêrgiz dan ber pêla

seyran û cejn mane xwînî dernakevin
di şikefta , mane winda , ranakevin

êşa mezin , kula giran , xwedya xala
dike hewar , li min îro , di newala

kerwanê wê ji hev gerya bû sed perçe
ma wê çima, gur û rovî ,neyên bexçe

hewara dil,her xwebighîn,şahê Kerwan
êş û sawêr , ji çar alya , l min civyan

hewara dil , ev ne jîne , ev ne jîne
here bi lez , peçê Kerwan , li hev bîne

ger em nejin , ji bo çavên , ziravbejnê
wê tim xûzbe , ber bi jêrde , ala cejnê.

6.2.1988

.

GULA BIN LINGA

Gula nav baxa ketye bin linga
Sitêra şaxa avêtin tinga
ji wê dûrketin dost û yarên wê
demê jê dizî destûra renga

* * *

pelkê ji xwînê îro mane zer
tîne bîra xwe cejna şaxê ter
dem li wê bûne bi carek payîz
nema xuyaye birhên qaz û qer

* * *

li ber bahozê tenê dinale
jar û perîşan mest û merdale
bûye hêlîna keserên kevnar
civata hêsra herdem li bale

* * *

ketye bin linga ketye bin kevir
davên nav çava tîrên ji agir
digrin devê wê digrin çavê wê
li wê gurdikin kurmê ji hindir

* * *

berê xuyabû şêrîna baxa
Qîza dida hev li serê taxa
pêwanî dikir li evîndara
niha ew maye kalanê daxa

* * *

ji mêj tê avdan bi hêsrê çava
ketye paş perda bûka bê zava
ji nava xwelyê Serî hildide
dema dibhîze gurînê tava

* * *

tavên biharê werin vir bi lez
werin bê teyrok bê tîr û terez
werin civanê gula li takî
hêvîdarim ez ji şivanê Pez

* * *

6.2.1988

.

DESTÊ MIN BIGRE

Destê min bigre pir xweşe cîhan
da em derkevin serê van çiyan
gulên ser şaxa tevde va vebûn
ez û te hîna mane perîşan

* * *

Destê min bigre ti car bermeda
da em derbaskin bajar û gunda
dostê me pirin li vê jîna xweş
lê wek me îro tev mane winda

* * *

Dema li me da pêla bayê sar
ji ber wî bayî me barkir ji war
cîhan bû tarî co tev miçiqîn
şikestin ev gul hêvya evîndar

* * *

Lê îro bihar mizgîn va anî
ji binê çiya derbûne kanî
ewrên li ezman ji hev belabûn
Mem û Zîn rabûn ji gora Xanî

* * *

15.11.1983

.

KETINE XEWÊ

Ketine xewê her sê çar pêwan
were civana ey yara ciwan
were netirse ji heyva çarda
tenê ew zan e bi derdê giran

* * *

Kanîn sozên te ka sûnd û peyman
îro tev bûne wek mij û leylan
bê zar û hişim piştî çavên te
te ez xapandim ey yara ciwan

* * *

Newêrim bêjim wan herdû nava
te ez mirandim mala te ava
kanî bextê te ey yara ciwan
rokê di gel te ez nebûm zava

* * *

nebêj dayka min zanim te wakir
nebêj bavê min te soz xerakir
te ez hiştim jar ey yara ciwan
pîrozbe zava çima te wakir

* * *

Xwezî rûkê te min qet nasnekra
xelat dilê min xwezî te nebra
cihê te nagre ey yara ciwan
di dilê min de şêrîna gewra

* * *

Divê ez bavêm vî dilê nexweş
li şûnê deynim sor kulîlkek geş
da ku ez bijim ey yara ciwan
bê evîna te dil şad û serxweş

* * *

Ezê gulek nû ji xwer bibînim
agrê di dil de ezê vemrînim
bê te ez namrim neyara bê soz
xewna li ser te ezê bimrînim

* * *

25.4.1987

.

GULA ZOZANA

Gula zozana ezim
dosta şivanê pezim
ezim avya kulîlka
ber bi kanyê dibezim
rengê minî ji agir
ez dertêm ji bin kevir
dema baran dibare
xweşik dibim ez bêtir

ez nêrgiz û beybûnim
li Bêxêr û Sasûnim
dosta dilê rêbarim
ez evîn û hebûnim
digerim ez war bi war
deşt û çiya û zinar
mizgînyê didim gula
rabin nêzîke bihar

xalxalok û ev perwan
kewê serxweş bi fîxan
pişti seyrana rojê
tev li min dibin mêvan
tirsa min ji şeva reş
hilke ji min pelek geş
lê bê kêrin xewn û kul
jîna mine roja xweş.

20.1.1987

ROKA EVÎNÊ

Evîn xewn û şoreşe
hêvya dilê nexweşe
ji bo bê zar Laleşe
di taryê de ateşe
finda rojên şevreşe
jiyan bi wê tim geşe

Evîn xwîna dilaye
hilm û bîna gulaye
li nav cîhan belaye
gora êş û kulaye
zora dest û milaye
aşê dengê lelaye

Evîn rewşa cîhane
Kewek tim bi fîxane
ristek li ser zimane
xewn û doza hozane
dengê neya şivane
xweşya jînê viyane

.

Evîn ceng û xebate
bez û ger û lebate
dost û dê û welate
tîrêja roj hilate
mizgînî û xelate
ji bo jînê kelate

Evîn deştek rengîne
bi dana xwe zengîne
mirov têde bi cîne
jîna wana bi tîne
mirî têde zendîne
roka jînê eevvîînnee

10.1.1987

.

RAHÊJ TEMBÛRÊ

Rahêj tembûrê pêre binehrîn
daxwaz û hêvya li min bicivîn
êşû sawêra ji nava kavla
bi dengê têla bê tirs bifirîn

* * *

rahêj tembûrê dil mest û gêje
li ser êşa wî helbesta bêje
perdakê bigre perdakê berde
ji nava têla hêsra birêje

* * *

rahêj tembûrê ev jîn windaye
qêrîna quling ji ber derdaye
ê ku venexwe cama evînê
ji dara jînê şaxek cidaye

* * *

cama evînê wer em binoşin
ewra ji ezman sivik bidoşin
xunav bibare hilbibin awaz
şahîyê bikrin kula bifroşin

* * *

rahêj tembûrê ew xweş hevale
weke min û te ew jî dinale
hêsrê awaza ti kes nabîne
mîna daxwaza dilê mendale

* * *

.

rahêj tembûrê bihûn awaza
bughere rengê rewşa tiraza
alîyê sivik wer xwe bide ser
da ker bibhîzin dengê mafxwaza

* * *

rahêj tembûrê wek Qadî Şero
çîrokê bêje bi şev û bi ro
çi hat serê pez bêje kîbû diz
çîrokek kevne nûdibe her ro

* * *

1.3.1988

.

XECXECOKÊ

Xecxecoka li ber avê
Kul û xema ji dil bavê
Pişti bejna tenî zirav
bawer bike min kes navê
xecxecoka sê çar pelî
şîn bû li ber ava gelî
dema perwan çûn ji dorê
keser di sîngê de kelî
xecxecoka nav zozana
çav ma li riya kerwana
tu yamine heta mirnê
nede kesî ti civana
xecxecoka li ser gora
neyara em xistin tora
hero êrîşû talane
kes guh nade va sînora
xecxecoka rû qurmizî
gul firoşa ji min dizî
tuj mîn dûrket xecxecokê
li ser lêva sarbûn xwezî
xecxecoka kurdistanê
bûka deşta Mûş û Wanê
ji ber hêsrê tenî kevnar
ez dinalim ji lêdanê

22 – 9 – 1988

ÇEMÊ FERATIM

Çemê Feratim ez têm ji bakur
şanî we didim êşa di hindir
sorin pêlê min ji destê agir
pêtin çavê min dicware awir

* * *

Çemê Feratim ez têm ji zozan
ji bo we tînim hêsrê Kurdistan
reşû zerbûne bax û gulistan
ka tol û doza mala Bedirxan

* * *

çemê feratim dikim xumexum
tovê neyara li ber xwe dibim
hespek sor dêlim dikim humehum
dijminê keftar rovî û gurim

* * *

ez têm ji bakur dirim ber başûr
di dest min dene dahol û bilûr
dest dipelînim ber bi qefda şûr
her min dajo şer ev birîna kûr

* * *

Çemê feratim derya kulame
xwîna sademe tîna dilame
gulav û miskim bîna gulame
yadîkî sorim li ser milame

* * *

yadîkî keskim yadîkî zerim
çiyakî gewrim rok û xencerim
neqşek ji xwînê li ser mermerim
hevalê şopa lingê şerkerim

* * *

2.8.1988

.

ERÊ CÛDÎ

Erê Cûdî erê Cûdî
rokê tenê rok te nedî
li te berfe li te şeve
ji te dûrin dost û xwedî

ma qey raste weynê jina
te xwarkirin wek sosina
bawer nakim vê çîrokê
çibkim ziman îro kina

destê dijmin tu xwarkirin
bi peymana tu parkirin
di sînga te wa bê fedî
birînek kûr va vekirin

ji birînê diherike
çemê Dicla pir girike
ew dilê tey wekî hesin
îro çima diterike

erê Cûdî serî hilda
hêsra bigre çava kilda
me navê vîn li vê jînê
ji bona te va me dil da

20.12.1985

GULISTANA MIN

Rojan dijmêrim dibhirin giran
li min bahoze serma û baran
gulistana min hîna bê gule
ji bo min maye îro goristan
gulistana min jêdera gula
gulistana min paytexta kula
gulên te îro tevde bûne kul
saza evîndar evîna dila

gulistana min ka bax û kulîlk
bê hêlîn mane şalûl û çivîk
ji te dûr ketin mane perîşan
li mil wa tûrik bi dest wa lalîk
îro dikin pars li deryê Bahoz
gulistana min ji bîr nabe doz
mizgînyê bighîn xar û pişkova
parsek bûne yek nêzîke newroz

nêzîke newroz dema cobara
cejna kulîlka hêvya hezara
perçe perçe bûn perdê şeva reş
kulîlk belabûn li dor zinara
ji binê ewra roka me derket
mûma vemirî ji nû va vêket
sivik dibhire kerwanê hêvya
bê xem dilêmin ji êvar raket

10.3.1986

DAYÊ.....

Dayê Cejna te pîroz
tuye ol û sûnd û doz
tuye roka vê jînê
bê te sare ev nûroz
cejna te va dîsa hat
roka adarê hilat
em hatine cejna te
tuye cejn û tu xelat

cejna te cejna gula
dîtna te hêvya dila
tuye buhişta rengîn
zora van dest û mila
salkê te ez hilandim
salkê te ez hejandim
bi helbest û bi hêsra
li nav ewra firandim

çi bînim ew bê kêre
xelat ne zîv û zêre
himber dana te nayê
dilê te mişt û têre
pirin zaz û sitiran
pirin govend û dîlan
wek lorîna te dayê
peyda nabe li cîhan

20.4.1987

MIRNA EVÎNÊ

Perçê ewrê reş xwe berdan ezman
tîrek dîn revya ji nava kevan
li min digere ser xak û bin ax
helbestê vînê ji tirsa revyan

* * *

tîrek ser zirav şefaqa mirnê
dahol û defe tê dengê zirnê
govend gerîya xwazgînî hatin
neyar bê fedî bi mila dirnê

* * *

zave nepirsî kiye dostê wê
lelên sitêmê xistin destên wê
gustîlka mirnê berda tilya çep
jiyanek pûçe hove hostê wê

* * *

zave nepirsî ji sitêrên şev
çawa bi dizî em diçûn ba hev
xwezî bipirsya ji dest û çava
ji ava kanyê yan ji lêvên dev

* * *

zave nepirsî tîra xwe berda
li ser doşeka lingê xwe rada
li kêleka bav li tenişta ap
gulistana min kir warê derda

* * *

zave nepirsî lê bi ya xwe kir
nîvê jîna min bi zor ji xwer bir
ez hiştim tenê bê dost û hêvî
li min helweşand sitûna hindir

* * *

ji nava xêlî min dît dengek hat
tevde rawistyan dev ji hev û mat
bû hewara dê li ser laşê sar
xilya serê wê zîzikîn xelat

* * *

tîra ser zirav dawî dît nêçîr
bê xwedî hiştin bazin û zincîr
baranê dayê barana çava
tenê dinale dilê minî pîr

* * *

gorek jêr kolan darbestek anîn
li ser wê xwendin dû perçe yasîn
bûka nexwestî birin nav mezel
li tenişt gorê darbest zû danîn

* * *

dahiştin gorê tev xeml û xêzê
kefen xeftan bû ji bona qîzê
gorek pir bilind li serê çiya
li pêşya mala bin dara gwîzê

* * *

berî ku bimre rokê hat civan
xewn û hêvî tev li hevdû geryan
keserik kişand ji kanya kula
ji çavên xewar dû hêsir revyan

destê xwe da min go min birevîn
min navê rihel bazin û livîn
min navê xanî min navên xwedî
bê kêre ev jîn ger nebe evîn

* * *

destê min bigre emê herin dûr
dostê mebe tim helbest û bilûr
da em bi cîkin van hêvyê kevnar
da em dermankin vê birîna kûr

* * *

destê min bigre min kesek navê
berî mê bidin tîrêjên tavê
emê derbaskin sînorê xewna
destê min bigre rade yek gavê

* * *

destê min bigre netirs ji mandê
bipirs li îro netirs ji findê
finda evînê şewqa xwe digre
ji fira şahîn bo kar û kedê

* * *

dema ku wê dît hêsir man bersev
berê xwe da mal bi lez dikir rev
revek bê hêvî ji destê pêla
pêlên mirna sar wek baranê şev

* * *

revya ji dest min xwe da dest demê
weşya gula min ji jora lemê
weşya ji lemê bê deng û lebat
berî dema xwe ji ber seqemê

* * *

Ezim neyarê wê dosta mirî
min li ber wê girt ji tirsa derî
ma li ber berfê ma li ber germê
ket nava destê dêwê sê serî

* * *

tuye payîza gula çilmisî
ev êş te danê tev nanê tisî
te ew hişt li jêr te ez kirim mêr
rokê te ji dil çima nepirsî

* * *

ji bo gulên xwe em tev neyarin
li nav baxê xwe em bê biharin
cîhan pêşve çû em mane li paş
em li serê xwe hîna siwarin

* * *

23.1.1987

.

RABE ...DILÊ ...MIN

Dilê min bûye mizgefta kevnar
lê hatin pêçan perde û dîwar
birûsk û çirûsk îro jê derbûn
qêrîn û nalîn lav lav û hewar

* * *

nalîn û hewar kesek nabhîze
çerxa felekê bi min dilîze
sorgul venabin li nav baxê min
cîhan tim li min bê deng û zîze

* * *

xewn û hêvyê min gihabûn ezman
tevde herifîn bûn kavlê wêran
xewn û hêvî çûn li ber pêlên dîn
dil maye winda mest û perîşan

* * *

de rabe rabe rabe dilê min
gelek girane barê milê min
hêstirên çava neyarê tene
bese tev ranek êşû ku lê min

* * *

heyfa vê jînê here bi girî
dilo netirse zûye tu namrî
serê xwe hilde li jor binere
li ser min û te dirêsin qumrî

* * *

1.12.1987

BIHARA...DÎN

Barkir ji nav gund şêrîna dila
li min helweşand wê baxê gula
barkir bê xatir di şevek tarî
ka zê bidim kê kildanê Kila

* * *

ka zê bidim kê soz û civana
kî wê bavê dil tîrên kevana
min cî raxistin berî ro ava
mane sar û rast cihên mêvana

* * *

bi wê min naskir dilê xwenî jar
bi dîtina wê derdibin bihar
pişti barkirna rêbera jînê
dil maye xemgîn winda û rêbar

* * *

rêbarkî winda li ser va riya
gurê ser çiya bi wîna girya
hawêr dinere pêl û bahozin
perda şeva reş li wî neçirya

* * *

ew bû ronaka taristana şev
saz û helbesta herdû lêvên dev
kelekbû bo min di nava derya
bi wê min dikir ew dîlan û rev

* * *

li ezmanê min ew bû qaz û qer
heyva çardabû dema nû tê der
ket pişta ewra ji mêj windaye
çû ber ro ava çûnek bê veger

* * *

Efsana xewna îro bû leylan
hêvya dilê min çû li ber talan
min şûr nekişand rokê ji roja
lewra ew rizya di nava kalan

* * *

pelik têne xwar ji ser nû şaxa
sorgul zerbûne di nava baxa
bihara rengîn li min bû payîz
dil hatye sotin bi arê daxa

* * *

arê dûrbûna sazên evînê
arê pîzotên şevka civînê
pêtên bihara bê gul û beybên
bê deng buhûrî berî şevînê

* * *

ey bihara dîn sivik te barkir
hêlîna sala te l' min xerakir
te ez hiştim jar li şûna wara
kanîka hêvya te l'min ziwakir

* * *

12.3.1987

.

HOZANÊ SAX

Ji xewa dirêj rabe Ciger xwîn
ça û deşt û lat ji ber te hejîn
Sitêr û Şepal Rewşê û Reşo
Mîdya û Salar li ser te digrîn

* * *

rabe Cigerxwîn hozanê gernas
li ser dengê te şiyarbûn mêrxas
bûn hevalê te jar û perîşan
rêça azadyê te b' me daye nas

* * *

rabe Cigerxwîn heyva şeva reş
dîsa birêse xêz û ristên xweş
hîn dûre payîz ji sînorê te
rabe bikene bi wî rûkê geş

* * *

destê mirinê çawa l' te gerya
bêvla mirinê çawa nexurya
pir mat û şaşbû ew mirna dijwar
lê mirin bi xwe li ser te girya

* * *

man li şûna te Hêvî û Ronak
ma li şûna te Zendevîsta pak
bi tîn û bîne ew Pirîsk û Pêt
ronya Şefaqê ji bo me bû mak

* * *

Sewra Azadî dibê Kîme ez
şalûl û bilbil li pey dikin bez
Rewşê û Reşo gernasê Soro
Salar û Mîdya tên lêva bi gez

* * *

rabe Cigerxwîn bibîn Hesarê
Kelehên mirnê bi lez tên xwarê
şopa sor dikşe li nav mêrgê şîn
nêzîk bû newroz bûka biharê

* * *

heval Pol Robson dilê bi aram
Diyan Biyan Fû sitêra Vîtnam
Girê gernasa reş xwe girêdan
bi ax û nalîn ji Şam heta Şam

* * *

dinale û digrî Qamişla rengîn
reş xwe girêdan Amûd û Efrîn
hatin pêşya te wek pêlên avê
xak û ezman tev li ser te digrîn

* * *

hatin serdanê Milî û Tata
Caf û Şikaka ji her welata
Zîbar û Zaza çayî û deştî
Xwezî bi saxî tu wer bihata

* * *

sitêra welat mirnê zû te bir
lê qet namirin ew alavên dir
ew xêz dibêjin ew rist û çîrok
bera nebêjin Cigerxwîn va mir

* * *

Cigerxwîn saxe nare j' ber çava
li serê çiya radide gava
di şevên tarî wek mûm û finde
lê Dîlber nedît mir û ma Zava

* * *

6.11.1984

.

DILÊ XEWAR

Rabe ji xewê ey dilê xewar
rabe ji xewnê bik qîr û hewar
roj diçin sivik bê kêre ev xew
derkev ji hindir pir xweşe bihar

* * *

hisbike dengê xumxuma çema
li mal bihêle derda û xema
bê kêr û bere ev nerîna reş
avbid wa dara kulîlk û lema

* * *

bipirs ji xuşkê çima xemgîne
êşû k esera bera nekşîne
porê berdayî bera bihûne
bi ser milan de gulya bişîne

* * *

derkeve nava gund û bajara
têkeve nava refên siwara
biner li hawêr bipirs ji her cî
çima tê dengê jar û hejara

* * *

bipirs ji gula çima bê tînin
ji dar û çema çima xemgînin
gulên nûhatî çima venabin
berî vebûnê êşa dikşînin

* * *

ew êşa giran tevde nasdikin
ji bo mirna wê tevde kardikin
lê pişkoj û xar êşê dibînin
ji gulistana bi şev bardikin

* * *

bipirs ji çiya çima deynake
tehta ji ser xwe çima ranake
wilo bê denge di bin destan de
ev nalîna wî qet jêr kêrnake

* * *

biger li cîhan li çep û li rast
sênya bi dest te bêşerma alast
bê fedî dixun şîv û paşîva
şîrê me meyand rokê nebû mast

* * *

çibkim em man jar dilê dilovan
pezê mey bela maye bê şivan
bi şev tên êrîş êrîşên gura
şeva reşû zîz li me bû mêvan

* * *

vemirî çira ji ber bahozê
çav hatin girtin bi ax û tozê
lê wilo nabe rabe dilê min
vêxe çira me nû bike dozê

* * *

ne gur û bahoz ne qeyd û zincîr
ne bumbe û top nejî şûr û tîr
nikarin bigrin destê min û te
heger em bavên va ramanên Pîr

* * *

rabe dilê min roka sor hilat
tîrêj berdane nav dilê welat
hêvya min û te hêvya demên reş
ji birîna kûr bi xwînêre hat

* * *

25.3.1985

.

TE EZ HIŞTIM

Carkê ji te nabim razî
te ez hiştim jar û tazî
min kir hewar lê tu nehat
para mine qîr û gazî

* * *

carek ji te nakim fedî
birîna dil ma te nedî
te ez kirim xwedî dijmin
ezim îro hirçê kedî

* * *

tirên karbû te ez hiştim
ji min dûrket te ez kuştim
dûr ket hêvî dûrket nalîn
tava sibê va ez şuştim

* * *

te ez hiştim wilo bê zar
li min kêmbûn gul û bihar
li min pirbûn xewn û raman
çavê zelûl maye şiyar

* * *

te ez kirim dava xema
ez dijmêrim în û şema
gazina min çima wilo
ebora dil êdî nema

* * *

24.5.1985

.

HÊVIYA MIN

Şeva reş tarî bi ser min de hat
perdê xwe berdan wek pêlê Ferat
şeva reşû zîz ji te bi tirsim
hêvya min maye roka roj hilat

* * *

bûye zivistan şev pir dirêjin
dost û evîndar tev mest û gêjin
çawa wê xew bê jaro dilê min
ji çavê yara rondik dirêjin

* * *

rondik têne xwar bi şev û bi ro
bandike digrî ezim hey'v û ro
ezim heyva we li bin ewrên reş
li min tarîne ev şev û ev ro

* * *

bese ev girî bese taristan
ezim gulîlka bax û gulistan
ev çend salê min hîna ez xarim
li ser sînga min pirbûn nêçîrvan

* * *

li pêş çavên we ez kirim bexçe
di nav destan de bûme çar perçe
rengê xwînê me pêt û agirim
lê dijmin îro rovî û hirçe

* * *

15.11.1985

.

ÇIMA TE BARKIR

Çima te barkir zû ji warê me
bûne reş tarî nû êvarên me
li ser te hêsir tên çem û cobar
bê gul dibhirin ev biharên me
birîna li dil ji nû te vekir
hêvya di dil de çima te kerkir
hêvî wilo çûn ketin bin axê
mirnê bi minre bê fedî şerkir

li ber çavê min li pişt ro ava
di nav çiyan de dibînim çava
wek du sitêra wek Mem û Zînin
çibkim li çava ro çûye ava
di bin axê de li wan taristan
li ser wan digrî neynik û kildan
sibê dibêjim bi roj û bi şev
kengî li gel wan zê bibm mêvan

piştî wan çava min navê jiyan
piştî çavên reş du birhên kevan
ji bîrnakim ez soz û peymana
di dil de dijin ew şev û civan
piştî çavên te bo min çiye jîn
dil qet nagire du carî evîn
zindana jînê têde zê çibkim
ger reş û sarbe limin tim hêlîn

16.8.1985

LI WELATÊ MIN

Li welatê min keroşk dibin şêr
li welatê min zarok dibin mêr
li welatê min kulîlk vedibin
li welatê min xwelî dibe zêr

* * *

tîrêjên rokê ji her cî dertên
hawêr şêrên me bi xwîn ji şer tên
di çep wa ronak di rast wa kulîlk
omîd û hêvî bi refa dertên

* * *

zarokên biçûk bê sûc tên kuştin
bi xwînê zinar îro tên şuştin
sûcê wan çiye bê buha dimrin
dilên daykê wa hate qeliştin

* * *

perwanên hesin gulle barandin
çîçekên zozan tevde şikandin
hawêr ewrên reş li welatê min
ji hêlîna germ bilbil firandin

* * *

li welatê min zinar bi çave
agir bi tîne piling bê nave
ewr û barane bahoz û berfe
li welatê min tiving silave

* * *

27.11.1985

PÊLÊN EVÎNÊ

Ji derya xema min dît pêlek hat
birînên li dil ji nûve dan kat
mû rabûn şipya dil bû jar û mat
pêlê ez birim nema kêferat

* * *

pêlê ez birim dûrket ro ava
kesek nabîne cobarên çava
kesek nabhîze hewarên tava
li hêvya xêlî hîn mane zava

* * *

pêlê ez birim di rojek şevreş
di dil de danî çar pîzotên geş
li ber min wê girt dergehên laleş
bê mey ez kirim bêhiş û serxweş

* * *

gazî dikim ez li gemyên derya
li ber xwe didim bi dest û serya
masî bi min re bê hêsir girya
perda şeva reş li min neçirya

* * *

li ber xwe didim lê pêl min dibe
qey kes nizane ma ka çi dibe
tovê bin axê hîn hişk û libe
baran dibare nêzîke sibe

* * *

26.4.1986

RÛPELÊN JÎNÊ

Rûpelên jînê min çirandin tev
ji ber bê kêre ev bazdan û rev
reva roka geş j i êrîşên şev
were em bigrin dîsa destên hev

* * *

rûpelên jînê tarî û reşin
li ser şaxên kevn mest û nexweşin
ji ber bahozê bê deng diweşin
li ber pêlên sar bê dil dimeşin

* * *

rûpelên jînê li min neyarin
li min payîzin li wa biharin
nabînin pîna dawdêl zîvarin
veşartîme ez dijmin hezarin

* * *

li pişta perda ez mame winda
bax û rezê min bûn kavlê kunda
bê xêlîye hîn seroka rinda
ji dûr dibînim çirûskên finda

* * *

bê ronak û find her ez windame
bê top û tiving jar û gedame
hêsrê sêwîya dengê sedame
şêrkî veşartî li paş perdame

* * *

ey jîna bê bext ezê xwe derxim
di nerîna wan hîna ez berxim
efsana cengê ez baz û rexim
rengê mirnême ez şûr û çerxim

* * *

jîna keysebaz feleka bê bext
we da pişta min ev tiving û rext
ji min we divê sed xelat û next
ji we dilê min kanî tac û text

* * *

24.7.1986

.

NESRÎNA MIN

Keçikek biçûk sor û gewr û boz
li min wê barand baran û bahoz

serî dihejand çep û rast û jor
diçûn cejna mil pêl û şîpên por

bi rêde diçû perwana serxweş
di dest wênade mûma şevên reş

çindik didan xwe rib û nîv û gaz
li ser lêvên wê ey reqîb bû saz

tev rakirin wê kulê dilê min
geş bûn di cîde pel û gulê min

nûbû hêvya dil piştî birîna
xweşe bi bilbil dîtna nesrîna

bilbilê xemgîn bilbilê jarim
bê welat û cî bê mal û warim

bi min pir xweşe dîtna nesrîna
xasma di kela germa havîna

nesrîna min bû ew keça biçûk
kulîlka çayê Metîn û Bakok

nesrîna teye ey welatê min
çima bê dengin deşt û latê min

nesrînê tene rabûne ji xew
bi ar çirandin taristana şew

windane îro li şarên cîhan
xwe dighînin hev bi hês'r û fîxan

da ku avakin pira jîna nû
ji ser te rakin vê sitêmê zû

nesrînê tene ey welatê jar
şaxik pişkivîn nêzîke bihar

nesrînê tene gulistana min
nêzîke dawya zivistana min

************ **6.6.1986**

.

XWEZÎ BIMAMA

Xwezî bimama wilo tim zarok
di dest min deba qewsik û zîzok

bêrîk tije ba ji kab û xara
nêçîrvan bama li dor kewara

sibê biçûma nava zaroka
civat bigerya li ser kevoka

dehfik me veda li serê tinga
bigerya lîzka xar û firinga

min têr bilîzta bi lagê kevir
kiras ji tozê biba wek çekur

ling û dest li min tev bibana xwîn
xwelî derman bû bê êş b û birîn

dema digerya lîzka heftoka
me l' hev diqetand tayê qimçoka

vir vira kevra li jor û li jêr
ji wê lîzka germ rokê nebûm têr

di lîzka kaba hinek dibûn mîr
hinek dibûn diz hin dibûn kizîr

li me çû girî lîzka babûtan
li ber dîwara tev lîqlîqî can

li me dihat xwar zik û ser û pişt
kîn û zik reşî me tevde dihişt

em dibûn cîran xanî ji xwelyê
sînor darikên botav û talyê

xanî bê serban ji xêz û xeta
li dor tenûra em dibûn çeta

dawî dibûn kav'l berî êvarî
di zik tenûra sar dibû arî

li ser cencera li dor bêndera
em dibûn neyar dijî kedera

ew cencera hişk dibû balefir
li ser kaya hûr dikir çireçir

diçû û dihat wek meşka sibê
me nedixwest kes bi sermede bê

carna em diçûn ber gol û çala
em tev diketin nav xewnê vala

geh jî me dilîzt bi çav girtînkê
bi dîk û mirîşk dismal gerînkê

ewqas lîzkê xweş tev bûne winda
carna xuyane li nava gunda

lîzka hingilyo bi qir û tevger
em pê digeryan li gund seraser

wilo rok diçû ber bi ro ava
jîna me lîzkbû di hemî gava

em û perdê şev dibûn dost ji dil
dayka mebû ew heyva çav bi kil

me xwe berdida nav kozîdana
carna nav çalên weke zindana

dûre em dibûn li hev dûbendê
mirî ji gora radibûn zendî

digerya lîzka çira dijmina
li ser guhera mî û bizina

dûre me dilîzt bi bûka mîra
dibû tûşe tûş di nav eşîra

hin dibûn xwînî yek ji wana bûk
ê din veşartî wek çetê pepûk

piştî wê dihat lîzka qijimqal
lîzka rênasa kanya hêvyên kal

dawî digerya civata dawî
dest û ling li me tev dibûn bawî

li ber agirê Pûşû lêmiştê
em dirêj dibûn ser derzka piştê

dihat govenda xewn û çîroka
hin li ser qelsa û pîr hevoka

li ser bê hişa li ser sitêra
li ser rovîyên şûna şikêra

dûre em diçûn bê dil ber malê
ji tirsa bavê ji pirsa kalê

malik min têtê li mal me digot
me hinav û dil li hevdû disot

di baxê xewna ser zirnazîqê
me xwe dida dest ken û tîqtîqê

geh li jor bilind li nav sitêra
geh li jêr bindest li nav sawêra

zirnazîqa me tiraza demê
baweşînkik xurt di rojên germê

Kanî nikil dîk çindik me didan
Cobar û lehî dibarya xwêdan

kanî hêlana werîs û beşta
gulyên kulîka li ser û pişta

ji hev belabûn wek gariso pij
ketin paş perda li wan bûye mij

bê kul û bê xem em diketin xew
wilo dibhûrî ew jîna derew

jîna zaroka bihara xewna
saxe di dil de namire ewna

ê ku karibe bimîne zarok
xwedî lîzk û xewn jîr û pir gerok

ewê kari be bibe ristevan
li pey ramana bibe nêçîrvan

bibe hevalê jar û dil mesta
bibe şivanê xewn û helbesta

xwezî bimama wilo tim zarok
di dest min deba kanî û zîzok

xwezî hilata rok ji ro'ava
vegeryana sal li paş bi gava

erê jîna min kesek bi xwezya
ti car nagire du cotên kezya

16 – 3 – 1987

.

DEF Û DAHOLIM

Avyê dinoşim ji dor birînê
perîka tînim ji bo hêlînê

gula diçînim li ser zinara
finda vêdixim ji bo êvara

destê xwe didim van jar û gedya
pira çêdikim bo dost û xwedya

kona vedigrim ji bo mêvana
riya vedikim li ser zozana

da nemîne tirs gura dikujim
li gelyê revê dûman û mijim

def û daholim ez di rojên şer
gulek rengînim li ser şaxê ter

gepik cûtîme di devê birçî
li pêş çavê dêw ez dibim qamçî

ji min nepirsin kanî kîme ez
berxek windame li nav keryê pez

lemek bin axim bê qûç li alî
li min jivistan dûmkir sed salî

pelek windame di nav dîrokê
ji min nepirsin pesnê çîrokê

pêlek bilindim di sînga derya
li ber xwe dibim cendekê mirya

18 – 2 – 1987

.

PERDÊN ŞEVÊ

Werin xwe berdin perdên şeva sar
hawêr me deynin rewak û dîwar

me biparêsin ji tîrên çava
pir bi tirsin em ji dengê tava

werin xwe berdin heyva min hilat
dîlbera şêrîn ji zindanê hat

dergevanê wê niha ketye xew
ji xwe danîne rextên Sê çar tew

ketye nav xewna zû şiyar nabe
berî ribabê ji xew ranabe

werin xwe berdin dîlber ditirse
gelawêj îro gelekî girse

li dor me pirin neyar û zik reş
dixwazin di dil vêxin pêtik geş

dixwazin ji hev me bikin cuda
xewn û hêvyê me tev bibin winda

pirin xwazgînî xwedî zîv û zêr
ji jor têne xwar bin lingê wê jêr

dixwazin bikrin dilê dîlberê
ji ber min bigrin riya vegerê

em ji tirsa wa bûne dostê şev
nêzîk dibin em ro bi ro ji hev

perdên xwe berde şeva dilovan
ji dest wan derxîn tîra nav kevan

26 – 2 – 1987

.

GULA BEJÎ

Du dostbûm em berî îro
tu bû perwan ez bûm hîro

tu bû Leyla ez bûm Mecnûn
bê'te sar bû ev reşhebûn

tu bû heyva şava çarda
lê ji dest xwe min tu berda

pêlên xewna ez birim dûr
ta ku birîn derbûn ji kûr

lê nû ji xew ez bûm şiyar
kerwanê dil lê bû êvar

tu bû xewn û xeyala min
şêrîn dost û hevala min

ka tu kanî mêvana dil
ma hîn reşin ew çav ji kil

yan ji hêsra bûne sor gul
gelek zorin ev êşû ku l

bûne sorgul di baxê rû
sînorê wan mane ebrû

pişti xweşyê bûne rêbar
mane payîz ew nû bihar

payîza wan hat berî çax
sorgul weşîn ji dora şax

payîza dil payîza çav
hiştin winda ew biha nav

bihara dil kengî wê bê
li min derê roka sibê

gula bejî ji nû derê
ez çi bêjim ew bê erê

av vegere xaçirêka
da em vekin va girêka

15.2.1987

.

BESE.....

Ma ne bese yara min
mişk û mara em xwarin
bêje ka bihara min
em çar tîş û sed parin
her yek ji me dibê ez
em tevde îro mîrin
gur ketine nava pez
kevanê me bê tîrin
kes xwe nade dest kesî
ji bo hev em neyarin
cotkar ji xwe napirse
çima ev xak beyarin
nale nala tivinga
hêsir ji wan dibarin
rabin weke pilinga
hêvî li dil siwarin
em tev sorin ji xwînê
perîşan û hejarin
ma ne şerme şêrînê
riyê me hîn hezarin

15 – 12 – 1987

.

Ferhad IÇMO **:**

Di sala 1960´î de li bajarê QAMIŞLO hatiye dinyayê, Li dibistanên bajarê QAMIŞLO xwendina xwe bi dûmahî aniye. Di sala1984´an de bawernameya-BEKELORYOS - di endazyariya şaristaniyê de ji zankoya HELEBÊ wergirtiye.
Berî helbestê, dil ketiye mûzîkê û di sala 1970´ê de dest bi lêdana tembûr û gîtar û cumbişê kiriye.
Lê di 29.07.1978´an de helbesta xwe ya yekemîn bi navê –EY ZEMAN- daniye.
Di piraniyên kovar û rojnameyên kurdî de helbestên xwe weşandine û nêzîka çil helbestên wî bûne stran, bi dengê:
Mihemed ŞÊXO, Beha ŞÊXO, Adil HIZNÎ, Selah OSÊ, Isma'îl CUMA, Gulistan SOBARÎ û ŞEYDA.
Heta niha pênc pirtûkên helbesta çapkirine:

1- LÊMIŞTA ZOZAN	**1988**
2- PIŞTÎ ÇI	**1995**
3- EVÎNA TE	**1998**
4- LANDIK-1-	**1998**
5-PELÊN SIPÎ	**2000**

Pirtûka LANDIK- 2- ya helbestên zaroka di bin çapêdeye.

NAVNÎŞAN
Ferhad Içmo
P.O.BOX:171-QAMIŞLO-Sûrî (Syria)
Tel: 00963 52422597 - 421012